KITÊBXANA HAWARÊ
HEJMAR
**13**

# ÇARÎNÊN XEYAM

DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

ÇAPXANA TEREQI
ŞAM
1939

4.KL.71 (7).

KITÊBXANA HAWARÊ
HEJMAR
13

# ÇARÎNÊN XEYAM

DR. KAMIRAN ALİ BEDIR-XAN

ÇAPXANA TEREQI
ŞAM
1939

# LI ŞÛNA DÎBAÇÊ

Rêya xwendin û nivîsandina zmanê kurdî bi fikreke welatînî berî sêsed salî bi destê Ehmedê Xanî hate vekirin. Ew Xanîyê ko bi dîn, zanîn û welatparêzîya xwe rêberê miletê kurdan e. Malikên jêrîn yên wî ne û qetek ji jiyîna miletê me ye. Xwedê bi rehma xwe giyanê wî şa bike.

Saqî tu ji bo Xwedê kerem ke
Yek cireyî mey di camî Cem ke
Da cam bi mey cihannima bit
Herçî me irade ye xuya bit
Da keşf bibit li ber me ehwal
Kanî dibitin miyesser iqbal
Idbara me wê giha kemalê
Aya buwe qabilî zawalê
Ya her wihe dê li istiwa bit
Hetta wekû dewr mintiha bit
Qet mimkin e ev ji çerxi lewleb
Talî bibitin ji bo me kewkeb
Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibitin ji xab hişyar

Rabit ji me jî cihanpenahek
Peyda bibitin me padişahek
Şirê hinera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn
Derdê me bibînitin ilacê
Ilmê me bibînitin rewacê
Ger dê hebuwa me serfirazek
Sahibkeremek sixenniwazek
Neqdê me dibû bi sikke meskûk
Ne dima wihe bê rewac û meşkûk
Herçend ko xalis û temîz in
Neqdên bi sikkeyî eziz in
Ger dê hebuwa me padişahek
Laiq bidiya Xwedê kulahek
Taîn bibuwa jibo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek
Hasil bibuwa ji bo wî tacek
Elbette dibû me ji rewacek
Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derî ji dest leîman
Ẍalib ne dibû li ser me ev rûm
Ne dibûne xerabeyî di dest bûm
Mehkûmi eleyh û sealik
Meẍlub û mitîê Tirk û Taçik
Emma ji ezel Xwedê wisa kir
Ev rûm û ecem di ser me ra kir
Tebeiyyetî wan egerçi ar e

Ew ar li xelkê namidar e
Namûs e li hakim û emîran
Tawan çi ye şahir û feqîran
Herçî bire şirî desti himmet
Zebt kir ji bo xwe bi mîrî dewlet
Lewra ko cihan wekî erûs e
Wê hikim di destê şirê rûs e
Lê eql û sedaq û mihr û kabîn
Litf û kerem û eta û bexşîn
Pirsî ji dinê min ev bi hikmet
Mihra te çi gote min go himmet
Hasil ko dinê bi şîr û ihsan
Tesxîr dibit ji bo wî insan
Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bilcimle ji bo çi bûne mehkûm
Wan girt bi şîrî şehri şihret
Tesxîr kirin biladi himmet
Her mîreki wan bi bezli Hatem
Her mîrekî wan bi rezmi Ristem
Bifkir ji Ereb heta ve Gurcan
Kurmancî ye bû ye şibhi bircan
Ev Rûm û Ecem bi wan hisar in
Kurmanc hemî li çar kenar in
Her du terefan qebîli kurmanc
Bo tîri qeza kirîne amanc
Goya ko ji Serhedan kilîd in

Her taife sed dikin sedîd in
Ev Qulzimi Rûm û behri Taçîk
Hindî ko bikin xirûc û tehrîk
Kurmanc dibin bi xûn milettex
Wan jêk ve dikin misali berzex
Camêrî û himmet û sexawet
Mîrînî û ẍeyret û celadet
Ew xetme ji bo qebîli ekrad
Wan dane bi şîr û himmetî dad
Hindî ji şecaetê ẍeyûr in
Ewçend ji minnetê nifûr in
Ev ẍeyret û ev iluwwi himmet
Bû manii xemli bari minnet
Lew pêk ve hemîşe bê tifaq in
Daim bi temerrid û şiqaq in
Ger dê hebuwa me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek
Rûm û Ereb û Ecem temamî
Hemiyan ji me re dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet
Temyîz dibûn ji hev meqalat
Mimtaz dibûn xudankemalat

Xani je kemali bêkemalî
Meydana kemalê dît xalî
Yanî ne ji qabil û xebîrî

Belkî bi teessib û eşîrî
Hasil ji inad eger ji bidad
Ev bidete ger xilafi mihtad
Safî şemirand vexwar durdî
Manendi derî lisani kurdî
Înaye nizam û intizamî
Kêşaye cefa ji boyî amî
Da xelk nebêjitin ko ekrad
Bê mehrifet in bê esl û binyad
Enwai milel xudan kitêb in
Kurmanc tenê di bêhesêb in
Hem ehli nezer nebên ko kurmanc
Eşqê ne kirin ji bo xwe amanc
Têk da ne di talib in ne metlûb
Vêk ra ne mihib in ew ne mehbûb
Bê behre ne ew ji eşqbazî
Farix ji heqîqî û mecazî
Kurmanc ne pir di bêkemal in
Emma di yetîm û bêmecal in
Filcimle ne cahil û nezan in
Belkî di sefil û bêxudan in
Ger dê hebuwa me jî xudanek
Alikeremek letîfedanek
Ilm û hiner û Kemal û izan
Şihr û xezel û kitab û diwan
Ev cins biba li ba wî mamûl
Ev neqd biba li nik wî meqbûl

Min dê ilim û kelami mewzûn
Ali bikira li banê gerdûn
Bîna ve riha Melê Cizêri
Pê hey biqira Elî Heriri
Keyfek we bida Feqihê Teyran
Hetta bi ebed bimaye heyran
Çi bikim ko qewî kesad e bazar
Nînin ji qimaş re xeridar
Xesma ko di vê esir de himyan
Maşûq û hebîb e bo me hemyan
Yani ji tima dirav û dînar
Her yek ji me ra we bûne dildar
Ger ilm temam bidî bi pûleq
Bifrûşi tu hikmetê bi solek
Kes nakete meyterê xwe camî
Ranagiritin kesek nizamî
Weqtê ko me dî zemane ev reng
Filcimle li ser diravî bû ceng
Hez kir me bibîne kîmiyager
Gava' ko me dî ne bû miyesser
Nisfiyye me pêlekê emel kir
Tesfiyyeyi cewherî dexel kir
Qelbê me ne kir qebûl hîle
Qet' bû xerezî ne bû wesîle
Dîn çû û ne ket bi dest me dînar
Paşê ji neçarî bûyne seffar
Sifrê xwe ê xef me eşkera kir

Qirtasiye bû me lê dia kir
Dawet kiriya bi sidq icabet
Bû wasiteyî qezayî hacet
Ev pûl egerçi bêbiha ne
Yekrû ne û saf û bê behane
Bêhile û xurde û temam in
Meqbûli meamila ewam in
Kurmanci ye sirf e bêguman e
Zêr nine bibin spîdeman e
Sifrê me ê sor e aşikar e
Zîv nîne bibîn ko kêmeyar e
Neqdê me mebêje kêmbiha ye
Bêsikkeyî şahi şehrewa ye
Ger dê bibiwa bi derb menqûş
Ne dima wihe bêrewac û mexşûş

Kes nine ji eşq bêeser bit
Mimkin ko ji zewq bêxeber bit
Her kes bi qiyasi himmeta xwe
Dê serf bikit iradeta xwe
Lê ekseri amiyan nezan in
Nefsa xwe ji bo xwe re nizanin
Nabalix û ebleh û sefîh in
Ya Zahid û sofî û feqîh in
Ew cahil û immî û sefîl in
Bê mirşid û rehber û delîl in
Naçar dibin li eşq bayih
Neqdê xwe didin bi hisn zayih

Hin serf dikin bi işi dinya
Hin pê dikirin serayi iqba
Ev her du celeb dibin ziyankar
Mehrûm dibin ji zewqi didar

---

Ev meywe eger ne abdar e
Kurmancî ye ew qeder li kar e
Ev tifle eger ne nazenîn e
Nûbar e bi min qewi şerîn e
Ev meywe eger ne pir lezîz e
Ev tifle bi min qewî ezîz e
Mehbûb û libas û gûşware
Milkê di min in ne mistear e
Elfaz û meanî û ibarat
Inşa û mebanî û işarat
Mewzû û meqasid û hikayet
Mermûz û menaqib û dirayet
Islûb û sifat û mana û lefz
Esla ne kirin me yek ji wan qerz
Bilcimle netaîci di fikr in
Dûşize û new-erûs û bikr in
Yareb mede destê xelkê nasaz
Vê şahidê dilruba û tennaz
Immîd ev e ji ehli irfan
Ew dê negirin li min çu herfan
Teşnî nekin wekî xeyûran
Islah bikin li min qisûran

Eshabi kemal perdepûş in
Erbabi ẍerez di pir xirûş in

Ez pîlewer im ne gewherî me
Xodreste me ez ne perwerî me
Kurmanc im û kûhî û kenarî
Ev çend xeberê di kurdwarî
Imza bikirin bi hisni eltaf
Isẍa bikin ew bi sen-î insaf
Esḥabi ẍerez ko guh bidêrin
Eyban bi kerem li min veşêrin
Ava rûyê şairî nerêjin
Ger mimkin e yeyke qenc bibêjin
Sehw û ẍeletan mekin teeccib
Têwîl bikin ji bo teessib

# ÇARÎNÊN XEYAM

Avahîya meyxanê ji şerabvexwarina me ye
Xwîna du hezar toban li ser stoyê me ye
Ko min guneh ne kir rehmet ji bo çi
Rewşa rehmetê ji gunehkarîya me ye

Ber çavên kûrbinan çi spehî çi kirêt
Warê dilketîyan çi dojeh çi bihuşt
Sitarên bêdilan çi etlas çi caw
Serînê dilketîyan çi balişne çi nivîn

Berî ko navê te ji dinyayê biçe
Vexwe şerabê xema te dê biçe
Kezîyên delalekê ji hev bike
Berî ko laşê te ji hev keve

Bide şeraba reng-gulbiroj ho meyger
Ji keserê can hat ser lêvê ho meyger
Da ko bêhiş bikevim û baz bidim
Ji hişî û ji dinê ho meyger

Berî ko xem şevxwînê bike
Ferman ke delalê şeraba sor bînin
Tu ne ew zêr î ho jîrê mezin
Ko ji axê wedigerînin ji nû ve tînin

Bê vîna min ez anîme heyînê
Jînê ji heyranîya min pê ve tiştek zêde ne kir
Bi zorê çûn û me seh ne kir çi bû
Ji vê hatin û mayîn û çûyîn miraz

Binêre ji dinê kara min çi bû? hîç
Ji rojên borî destê min de çi ma? hîç
Ko çira xweşîya min vemirî çi ma? hîç
Ez piyana şerabê me ko şkiyam çi ma? hîç

Çendan li dora xwe dinêrim
Ji çemenan buhuşt e ji kewserê çem
Deşt wek bihuştê ye gotina dojehê berde
Rûne vê bihuştê de bi delaleke bihuştdem

Dema spîdeyê ye delala qedrgiran
Lêva te bi stran be destê te bi piyan
Bi hezaran Cem û Key xistin erdê
Ev çûyîna Tîrmeh û hatina Gulan

Dinê ji jîna me a peritî awirek e
Ceyhûn ji hêstirên me ên bi xwîn avek e
Dojeh ji cefayên me ên bêtişe çirîskek e
Bihuşt ji dema dilxweşîya me bihnek e

Dil veşartiyên jiyinê xweş seh bikira
Veşartîyên Xwedê li ser mirinê ewê bizanîya
Îro ko tu li cem xwe yî te tiştik nizanî
Sibe ko tu ji xwe çûyî ma çi dixwazî bizanî

Dilo tu veşartîyan nikarî seh bikî
Û li ziravîya zanayan tu nikarî bigehî
Tu di vê de bi mey û piyanê buhutşekê ava bike
Wê dera ko buhuşt e digehî an nagehî

Da ji xweşdiliyê bi tinê nav maye
Wey hevalê gihayî şeraba xav maye
Destê xweşîyê ji şerbikê şerabê mekşîne
Îro ko destê te de bi tinê piyan maye

Di mulkê te de bi ibadetê tiştek zeyde ne bû
ne bû şeng
Ji gunehên min tu tişt ne kêm bû ne bêreng
Bixefirîne û me ezibîne ez xweş dizanim
Tu efûkerî bi lez î û ezabkerê dereng

Duh di ber meyxanê re derbaz bûm bêhiş û mest
Û min pîrek serxweş dît misin bi dest
Min ji pîr re got ma tu ji xwedê şerm nakî lo
Go kerem ji Xwedê ye de her şerabê vexwe lo

Di çerxa dinêya bê binî de
Bi dilxweşî vexwe şerabê dem bi cewr e
Ko nob giha dema te ax meke
Ev piyanek e ko hemîyan re didin firkirin bi dor

Dilopek şeraba kevn ji dewleta nû ronaktir e
Û her çi ne şerab e avêtina wê paktir e
Piyanek şerab xweştir e ji milkê Ferîdûn
Derxwîna denê şerabê ji taca Key çaktir e

Dewra dinê bê şerab û meyger xweş niye
Bê nay û bê blûr ma dinê çi ye
Çiqas li dinê mêze dikim dibînim
Tiştê dimîne qencî ye yê mayî valayî ye

Dilxweş bibe berê jîna me bihnek e
Her liba wê ji axa Cem û Keyek e
Halê cihanê û binyana jînê
Xew û xewnek e û xapandina demek e

Dinê de berê dara rastîya kûr ne giha
Lew di wê rê de hemî ne rênezan
Her kesî destê xwe bi çiqlekî sist girtiye
Îro wek sibe sibe wek roja pêşin e bizan

Dilê min her bi rûyekî gulîn ve girêdayî ye
Destê min her bi piyana şerabê dadayî ye
Ez ji her pişkê behra xwe dibim
Berî ko behra min bi hemûyan hevda ye

Ev karwana jînê ecêb dibore
Gulı bide dema şahîyê dibore
Meyger xema xavîyan mekşîne
Bîne piyanê şev dibore

Ev rojeke xweş e hewa ne germ e ne sar
Ewrî toz şuşt ji lamên gul û dar
Bilbil bi zmanê xwe ji gula zer re got
Rabe dema vexwarina şerabê ye digel yar

Ev stirîyên ko dipelixin li bin pêyên heywanan
Gulîyên spehîyan e û birhên ciwanan
Her pîkê ko li ser banê qesrekê dibînî
Tiliyên wezîran e û serên siltanan

Ev şerbik wek min aşiqekî zar bû
Destê wî li ser gulîyên yar bû
Ev destikên ko di gerdena wê de dibînî
Destek e ko li gerdena yarê giriftar bû

Em gî dilketî ne û şerabperest in
Di kavilî de rûniştîne serxweş û mest in
Ji spehîtî û kirêtîyê wehm û xiyalan dest kişand
Ji me hiş mexwaz em gî şerab bi dest in

Ewên ko dorhatîyên zanînê bûn
Û bi berhevkirina zanînê xetirekên civatan bûn
Ji wê şeva tarîyê rê dernexistin
Çêrokek gotin û ketin xewê

Ev dinyaya ko çend rojan bû pêgehê me
Ji xemê pê ve hiç ne bû destgehê me
Wey li me pirseke me jî hel ne bû
Çûn û hezar bêrî man di cergê me

Ev yaqûta giranbiha ji madenekî dî ye
Ev mirarîya yekane xwey nîşaneke dî ye
Xema vê û wê dinê wehma min û te ye
Çêroka hevînê xwey zmanekî dî ye

Ev çerxa cefaya bilind - binyad
Veşartiya xwe ji her kesî nixumand
Kû derê de dilekî brîndar dît
Daxek dî di ser brîna wî de gihand

Ez şerabê vedixwim ji çep û rast qîr û qal e
Dibêjin ew dijminê din e mexwe betal e
Ko min seh kir şerab dijminê dîn e
Bi Xwedê ezê vexwim xwîna dijmin helal e

Em kafirê hevîn in misilman tişteki dî ye
Em mûrîyê jar in Silêman tişteki dî ye
Ji me rûyê zer û cilên kevn bixwaze
Bazara zîvfroşan ciheki dî ye

Em ji neyinê pak hatin û bûn nepak
Em bê keser hatin û bûn xemnak
Em bûn rondik li ser agirê dilî
Jîn dane bagerê bûn ax û sêlak

Eya ko bijartîya cihan î ji min re
Delaltir î ji can û çavan ji min re
Rûrojê ji cani şêrîntir hîç nîne
Tu sed car ji canî şêrîntir î ji min re

Em îro dilketî dìwane ù mest in
Îro dêra spehîyan de mey perest in
Ji heyîna xwe yekcar dûrketî ne tev
Û di mihreba elestê de destbest in

Gulê go ez Yùsifè çîmengeha Misrê me
Ez im yaqûta giranesl û devzêrîn
Min got ko tu Yùsif î ka nîşana te
Got ma nabînî kirasê min ê bixwîn

Ger rûyê dinê hemì ava bikî
Bi qasì şakirina dilekì nabe
Heke te yekí aza bi qenciyê ji xwe re dîl kir
Bizane ko ji azakirina hezar dìlan çètir kir

Gulrûyê piyan û şerbikê şerabê bigire
Pê lêva avê ù mêrg û çimenan bigire
Ev feleka bê bext zehf rûheyvan
Dike sed car şerbik û sed car piyan

Ger hatin bi min buwa ez ne dihatim
Ger çûyìn bi min buwa ma ez diçûm
Xwezî di vê cihana durû de
Ne bûn ù ne hatin ne çùyîn buwa

Gava hevina pêşîyê ez li hev dam
Ji min re a berê dersa hevînê da
Piştre ji parîyê zêrê dilê min
Çêkir mifteya gencîneyên manan

Gayek ezmanî de ye navê wi Perwîn
Yekî din di bin erdê de xwey nivîn
Wek kûrbînan çavê hişyarîyê veke
Jêr û jora du gayan garanê keran bibin

Gulê got rûyeki ji rûyê min spehitir nine
Hevqas westa bûna gulavgirî ji bo çî ye
Bilbil bi zmanê halê xwe got
Ma ji bo kenîna rojekê kî salek nagirî

Heyvê bi ronîya xwe dawa şevê çirand
Vexwe şerabê demek wek vê bo te gihand
Dilxweş be û bîr bibe wî çaxê ko
Heyvê tirêjên xwe li ser gorna min û te daçikand

Heyf strana ciwanîyê çikihaye
Ev bihara şahîyê êdî ne maye
Ew çûka cejna ko navê wê ciwanî bû
Hawar çawan hat û kengê firiyaye

Hevalên canî ji dest derketin
Hemî li pey ecel ketin
Civata jînê de hevalşerabên me bûn
Çendek zêde vexwarin û sermest raketin

Herçend reng û rûyê min spehî ne
Wek lale sorlam û wek selwê bi bejn û bal im
Diyar ne bû di karxana axê de
Neqşker ji bo çi ez xemilandim

Heke min dest dirêjîya gulîya te dikir
Ne mecazî bi rastî min ew dikir
Min gulîya te de dilê xwe ê dîwane didît
Min ji dilê xwe re destdrêjî dikir

Heya kengê gotina çar û pênc ho meyger
Çi yek çi hezar sehkirin dişwar e ho meyger
Em hemî ji axê ne kemançe werîne ho meyger
Em hemî ba ne şerabê bîne ho meyger

Ho çerxê tu her dilê min xemgîr dikî
Kirasê min ê rengîn zìrzîr dikî
Bayê ko li min dide av dikî
Ava ko vedixwim devê min de ax dikî

Halê gul û şerabê şerabperest dizanin
Ne ên tengdil û tengdest dizanin
Nebîrewer ji nezanînên xwe bêsûc in
Vê şiverê de xweşîyek e mest pê dizanin

Hawar nanê pehtî li destê nepehtîyan ket
Xweşîya dinê li destê bê kêran ket
Ew çavê spehî ko bergehê dil e
Di ser sînga xulam û nezanan de raket

Ho gulê tu wek rûyekî dilhevîn xuya dibî
Ho şerabê tu wek lêva canrevîn xuya dibî
Ho bextê şerût tu bi min re
Her dilsar î lê xemrevîn xuya dibi

Jînê de pesna şerabê lêvzîna min e
Ji şerabê pêve tu tişt ne dilxwaza min e
Mela ko seydayê te hiş e xweş be
Seydayê te bizan feqehê min e

Ji tiştên hê neketî rûyê xwe zer meke
Bi tiştên nehatî dilî de şer meke
Ji dinêya bêbext para xwe bibir
Berî ko dinê te lal û kher bike

Ji deftera jinê navê me dê rabe
Dawî destê ecelî de mirin e çare nabe
Meygerê çeleng xweş xweş bîne
Emê bibin ax daxwaza me şerab e

Kezeb nîne ko ji bêrîya te xwindar mebe
Kûrdîtîyek nîne ko ji te re giriftar mebe
Li ba wan ko hevîna kesekî seh nekirin
Dilek nîne ko ji hevîna te jar mebe.

Ji menzila kufrê heta dînî bihnek e
Ji alema şikê heta yeqînê bihnek e
Qedrê vê bihna delal xweş bigire
Çiko berê jîna me tinê ev bihnek e

Ji nivîna xwe rabe rabe lo meyger
Dagire dagire şeraba zelal lo meyger
Berî ko qafê serê me bikin şerbik
Piyanê ji şerbikî dagire lo meyger

Ji hatina biharê û çûyîna pehîzê
Pelên jîna me dikevin ji rêzê
Vexwe şerabê xem mexwe ne gotin xirab
Xema cihanê weke jehr e tiryaka wê şerab

Ji batin û çûna me kar çi ye
Berê hêvîya jîna me li kû ye
Di çerxa canî de çend mirovên pak
Şewitîn û ax bûn ma dû li kû ye

Ko tu şerabê venaxwî lewma meke mestan re
Ko tobe da ezê tobe bikim ji yezdan re
Pesnê te ew e ko tu şerabê venaxwî
Sed kar dikî ko mey tiryak e ji wan re

Ko Şeraba te heye toba şerabê meke
Tobedar hezar car jûvaniyê dê bike
Gulê çara xwe qetand bilbil dike hawar
Ma li dema wek vê tobe dibe kar

Lêva avê digel piyan şerab û meyger
Bihuşta min û te ye delal e ew der
Dest ji gotina bihuşt û dojehê bişo
Ma kî çû dojehê û hat ji bihuşta zer

Meyger binêr min dil ji teşqeleyan vala ye
Şêr hemî çûn niho daristan vala ye
Her şev piyana ezmên kefên şerabê diavêt
Îro ko noba me ye piyan vala ye

Meyger binêre li bêkesan ji bo Xwedê
Bişkêne xaçê me heweskeran ji bo Xwedê
Em masiyên bê av in tu î ava jiyînė
Me bighîne xwe meygero ji bo Xwedê

Meyger kesera min bilindawaz bû
Serxweşiya min bê bend û bê gaz bû
Bi porên spî serxweş im ji şeraba te
Bihara dilê min ciwan û saz bû

Meyger gul û çîmen bûne sor û kar
Bal bide pişt ḧeftekê ev dibin ax û jar
Vexwe şerabê û gul biçine bihnekê de
Gul dibe ax û çîmen dibe jengdar

Min di mestxaneyê de pîrek dî
Şo got ji çûyiyan xeberek nadî
Got vexwe şerabê wek me gelek çûn
Û ji çûyiyan kesek şûnda nehatî

Madam çûyîn bê guman e ma bûn ji bo çî
Xaçerêya timayê de westabûn ji bo çî
Herwekî mayîn tune ne bû û nabe
Ji bîrkirina çûyînê û dilxweşbûn ji bo çî

Nivîna axê de raketîyan dibînim
Di bin erdê de veşartîyan dibînim
Çendan li deşta neyînê mêze dikim
Nehatîyan û çûyîyan dibînim

Piyana te de yaqûta rohn heye ho meyger
Dilê min wek yaqûtê geş ke ho meyger
Piyala tejî bide destê min ho meyger
Da bi wê canê xwe vejinim ho meyger

Piyana tejî ko rengê xwe girtî
Şkênandina wê serxweşek çawe babet dibîne
Hevqas ser û ran û kef û destên delal
Bi hevîna kê gihane hev bi erna kê şikestin

Rabe xema cihana beza mexwe
Şa be gul biçine mey vexwe
Di xulqa dinê de bext hebuwa
Ma ji yên berê dor digiha te

Rojekê ji benda dinê aza ne bûme
Bihnekê ji jîna xwe şa ne bûme
Herçend min pir feqîtîya dewranê kir
Lê dewrana dinê de bêj seyda ne bûme

Ronî û şerab û tava heyvê ho meyger
Û delaleke yaqûtreng û nazdar ho meyger
Şerbikekî şerabê bide min berî ko
Şerbikan çêkin ji axa min û te ho meyger

Roja ko hespê ezmanî tê de zín kirin
Û Mişterî û Perwin rewşa wî kirin
Ji dîwana qezayê nesîbê me ev bû
Ma gunehê me çi ye qismetê me ev kirin

Rûroj rabe û were ji bo xatirê me
Hel ke mişkilekê wek daxwaza dilê me
Şerbikekî şerabê bîne de em vexwin
Ji pêş dema ko şerbikan çêbikin ji axa me

Refa rindan ji hevalan bibe gir
Li dawa zihda zahidan bikeve agir
Ew xirqeyê sedpîne û ew hirîya heşin
Bikeve bin peyê dilrindan û bibe pir

Roja ko li te borî godarîyê meke
Bo siba ko hêj nehatî zarîyê meke
Li ser xema hatî û çûyîyan menive
Xweşdilbe û jîna xwe xira meke

Rûyê yarê wek gulekê bişkivî ho meyger
Dest ji sofîtîyê bikşîne ho meyger
Berî ko mirin pêşîya me bigire
Badîya şeraba sor bîne ho meyger

Rabe şerabê bide min gotin ji bo çi
Îşev devê te ê kiçik qismetê min e
Ji min re wek lama xwe a sor şerabê bide
Çiko toba min wek biskên te nehevgirtî ye

Spîdeyê de dengek ji meyxaneya me hat
Go gelo dîwaneyê me rindê xerabatî
Rabe de em piyanê tejî mey bikin
Berî ko dema dagirtina piyana me hat

Sernijdevanê rindên xerabat ez im
Ji gotinên bêcih gunehkarbûyî ez im
Yê ji vexwarina meya zelal bêxew mayî
Û bi xwîna kezebê lavelavkirî ez im

Spîde ye rabe ho gewherê naz
Nerm nerm şerabê vexwe bi nay û saz
Ên di xewê de veşartî ne zanîn
Ji ên borî kes venagere çûn bê awaz

Sibeh e xweş e dilxweşi ye ho meyger
Ko şeraba şevê maye piyanê jê dagire ho meyger
Piyanê bide destê min û qedrê vê demê bigire
Sibehê bibî livînê aqidê ho meyger

Şerabê vedixwim lê serxweşîyê nakim
Ji bilî piyanê destdrêjîyê nakim
Dizanî qesda min ji şerabperestîyê çi ye
Da ko wek te xweperestîyê mekim

Şeraba sor yaqût e madena wê piyan
Piyal e cendek e şerab e giyan
Ev pîpoka belûrîn ko ji şerabê biken e
Hêstirek e tê veşarti ye xwîna can

Şeraba sor û bihnmiskê dagire ho meyger
Da ji gotinên tewş bazbidim ho meyger
Şerbikekî şerabê bide min berî ko
Şerbikan çêkin ji axa min û te ho meyger

Şerabê bide destê min dilê min tihn e
Ev jîna bêbext direve wek bihn e
Rabe şahiya dil xewna şevan e
Rabe agirê ciwanîyê av e yek bihn e

Şev nîne ko hiş heyran mebe
Û ji girîna dawa min tejî ınirarî mebe
Piyana serî bi hevînê tejî nabe
Her badeya ko devnexwîn e teji nabe

Şerabê vexwe erdê de dirêj rakevî
Bê jin bê heval û yar tê bikevî
Vê veşartiyê bo kesî tucar mebêj
Guleke werihayî çû ne bişkivî

Şeraba sor dixwazim û şilır û dîwan
Bilıneke aza û hinek jî nan
Ko ketin dest rûniştina xirbeyî
Xweştir e jî welatê Mîr û Siltan

Tîra ecel re ma heye spêr
Hiç e lûleperiya zîv û zêr
Çendan li dinê mêze dikim
Qencî qenc e hew mayî bê kêr

Tovê min bi ava neyînê çand
Canê min bi agirê xemê şewitand
Wek bayê bêser dê bigerim li dinê
Heta cihê ko axa min tê gerand

Veşartiyên pêşîyê ne tu dizanî û ne ez
Ev tipa qewsele ne tu dizanî û ne ez
Gotina min û te di paş perdeyê de ne
Ko perde ket ne tu dimînî û ne ez

Vexwarina şerabê û şabûnî ayîna min e
Destkişandina ji kufr û dîn dînê min e
Min ji bûka dinê re got qelenê te çi ye
Got dilê te ê şa qelenê min e

Wey ji wey dilî re ko tê de agir nîne
Ji bo delaleke rûroj ne dilketî û dîn e
Roja ko bêşerab te ji xwe borandî
Ev e roja jinê a windatir bêjin e

Xwe bigire ji giyanî tu ê dûr bikevî
Li paş perdeyê weşartiyên Xwedê kûr bikevî
Şerabê vexwe tu nizanî hatîyî kû
Dilxweş be tu nizanî dê biçî kû

Xeyam bo gunehan ev şîn ji bo çi
Kêm an zeyde vexwarina xemê ji bo çi
Ji negunehkaran re xufranî nîne
Xufran ji bo gunehan e xem ji bo çi

Xwedêyo ji dilê min ê dîl re dilovan be
Ji sînga min a xemgîr re dilovan be
Ji pêyê min ê meyxaneçûyî re dilovan be
Û ji destê min ê piyan girtî re dilovan be

Yên ko di pêşîyê de çûne ho meyger
Bi xirîn di axê de veşartine ho meyger
Herê şerabê vexwe û rastîyê ji min bibihîse
Her çi jî gotine ba ye ho meyger

Yê ko halê dinê rast bi rast dîye
Jê re xem û şahî yek e hêsanî ye
Madam xweşî û nexweşîya dinê tê serîkirin
Ko xwest derd ko xwest derman be ferq niye

Yekî ji qehbikekê re got tu serxweş î
Û her gav di dawa yekê de rewş î
Jinkê got: melayo! ez herwekî tu dibêjî me
Ma tu weke xwe yî

Yê ko dinê de gunehan ne kir ki ye bêje
Û yê gunehan ne kir çawan jî bêje
Min xirabî kir ko te jî bi xirabî li min vegerand
Êdî nav bira min û te de çi ferq heye bêje

# Kitêbxana Hawarê

Hejmar

1 Rêzana Elfabêya Kurdî
C. A. Bedir-Xan

2 Rûpelinen Elfabê » »

3 Dilê Kurên Min
Dr. K.A. Bedir-Xan

4 Bîyişa Pêxember. Bi Kurdîya dumilî, bi dîbaca C. A. Bedir-Xan

5 Nivêjên Êzedîyan Bi dîbaca
C. A. Bedir-Xan

6 Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
C. A. Bedir-Xan

7 Mesela Kurdistanê Bazîl Nîkîtîn

8 Ji mesela Kurdistanê
C. A. Bedir-Xan

9 Elfabêya Kurdî
Dr. K. A. Bedir-Xan

10 Xwendina Kurdî
Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan

11 Elfabêya Min » »

12 Dersên Şerîetê » »